Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar : 379 nameronahi@gmail.com 09 - Gulan - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Gelê Efrînê berxwedana xwe didomîne

***Bi sed hezaran gelê Efrînê yên ku ji ber êrîş û zilma dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê Efrîn terikandin û li herêma Şehbayê bi cih bûn berxwedana xwe didomînin. Gelê Efrînê di bin şertên zehmet de dijî lê saziyên mirovî yên navnetewî alîkariyê nakin."***









Gelê Efrînê yê ji ber êrîş û zordariya dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ku cih û warê xwe berda û li herêma Şehbayê bi cih bû di bin hemû şer û mercên zehmet de jî berxwedana xwe didomîne.

Şêniyên Efrînê li kampa Serdemê tevî derfetên kêm û zehmetiyên jiyanê, berxwedana xwe didomînin. Lê rêxistinên mirovî yên navnetewî heta niha tu alîkarî nedane gelê Efrînê yê li Şehbayê.

Ji ber ku hejmara welatiyên Efrînê li kampa Berxwedan a Şehbayê zêde bû, Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Efrînê bi alîkariya rêveberiya Şehbayê, 7'ê Nîsanê kampa Serdemê li navçeya Ehrezê vekir.

Li kampê 250 kon hatin vedan û li kampê hezar û 300 kes bi cih bûne. Şaredariya Gel hewl dide kampê fireh bike. Gel li kampê bi riya komînan xwe birêxistin dikin û bi ruhekî hevbeş kar û xebatên xwe bi rêve dibin.

Rêveberiya kampê bi derfetên heyî xizmeta gel dike, alîkariya av û nan pêşkêşî gel dike. Her wiha ceyran û televizyon ji gel peyda kir, da rewşa herêmê û pêşveçûnên dawî bişopînin.

Heyva Sor a Kurd jî noqteyeke xwe li kampê ava kir û xizmeta tenduristiyê pêşkêşî gel dike. Şêniyên ku li kampan dijîn banga alîkariyê li rêxistinên mirovî yên navnetewî kirin.

Endama Rêveberiya kampê û Hevseroka Meclîsa Zagonsaz a Kantona Efrînê Hêvîn Reşîd diyar kir ku gelek rêxistinên mirovî soza alîkariyê didin lê pêk nayînin û diyar kir ku bi nêzîkbûna havînê re, pêwîstî bi gelek pêdiviyên jiyanî heye…

***ANHA***

## Pêngavek ber bi xwetêrkirina aborî ve

Melek DEMÎRTAŞ



Yek ji ling û stûnên sereke yên sîstema xweser û federal xwetêrkirina ji aliyê aborî ve ye. Li Rojava û bakurê Sûriyê her diçe aborî û projeyên wê bi pêş dikevin. Di wê çarçoveyê de, gelek kargeh hatin vekirin û bi sedan derfetên kar jî hatin afirandin. Karegeh jî tevî kêmderfetiyan hewlên xwe di pêşxistina aboriyê de dike.

Yek ji van kargehên ku di nava demek kurt hatine vekirin û berhem dide kargeha ROJ a madeyên Blastîkî li Herêma Cizîrê ye.

### VEKİRİN Û ŞÊWEYA KAR

Rêvebirê kargehê şaxê Amûdê Raxib Mihemed di derbarê vebûna kargehê de agahî dan Rojnameya me Mihemed dazanîn ku Kargeha Roj beriya 5 salan li bajarê Qamişlo vebûye, piştî 2 salan li Amûdê jî hat vekirin. Di vê navberê de gelek derfetên kar ji bo welatiyan hat peydakirin.

Kargeh ji sedî 60 madeyên balîstîkî çêdike. Qutî û şaşalên ji bo madeyên paqijiyê LODALÎN, TÛRSÎL û her wiha ji bo xwarinê mîna satilên mast çêdikin.

Mihemed got "Carnan em tiştan li gorî daxweziya bazirgan û pêdiviyên civakê çêdikin. Kalîteya berhemên me ji sedî sedin, madeyên çêkirina bilastîkan ji Heleb û Şamê tînin, wekî (Bolî probolîn) (Bolî Êsîlîn)

### ÇAWA KARGEH MEZİN BÛ?

Di destpêka vekirina kargeha Roj de. Tenê du maşîneyên çêkirinê û depoyek hebû; di encama danûstandina baş bi bazirganan re kargeh berhem zêde hat xwestin û kargeh fireh bû. Niha ji 2 maşîneyan buye 6 maşîneyên çêkirina bilastîkan hene. Bi gîştî ji di kargehê de 6 karmend 2 jin û 4 mêr rojê 8 satan dixebitin mehê jî 60 Hezar Mûçe distînin.

Rêvebir Raxib diyar kir ku wê di rojên pêş dema parçeyên Maşîneya Kursiyan temam bibe, wê dest bi çêkirina kursiyan bikin.

### 9 HEZAR Û 500 QUTÎ



Qutiyên zelal yên avê tenê di kargeha roj de tên çêkirin û li hemû kargeh û bazarên Herêma Cizîrê wek kargeha Berfîn a çêkirina madeyên paqijiyê tên belav kirin. Kargeha ROJ jî rojane 9 hezar û 500 qutiyên cur be cur çêdikin, ji Serê Kaniyê heye Dêrikê têne belav kirin, ji bo wê jî zêdebûn di kargehê de namîne. Lê pêwîste ku di kargehê de dêpoyek hebe, ji bo ku dema bazirgan mîqdarek mezin bixwaze hazir hebe, wisa em ê him ked û him jî dem qeznac bikin."




Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 379 09 - Gulan - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Hindik maye QSD bigihêje çemê Firatê



Piştî ku Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê merheleya dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê ragihand pêşdeçûna şervanan berdewam dike. Di çarçoveya pêngavê de şervanên QSD'ê kîlometreyeke din jî nêzî çemê Feratê bûn. Tenê 4 kîlometre man ku hêzên QSD'ê xwe bigihînin gundê Bakozê yê li qiraxa Çemê Firatê.*R-2*

# LI EFRÎNÊ ZILM, ÊŞKENCE, TALAN Û REVANDIN



***Dawî li kiryarên hovane yên leşker û çeteyên dagirker yên dewleta Tirk li Efrînê nayê. Leşker û çeteyên dagirker li Efrînê bi her awayî zilm û hovitiyê li dijî gel pêk tînin. Welatiyan direvînin, malên wan talan dikin û dest datînin li ser milkên wan.***

## DIREVÎNIN Û PEREYAN DIXWAZIN

Efrîn piştî ku ji aliyê dewleta Tirk ya dagirker û çeteyên wê de hat dagirkirin li pêş çavên hemû dunyayê kiryarên der mirovahî li ser gelê Efrînê berdewam dikin. Welatiyan direvînin û li miqabilî wan pereyan ji malbatên wan dixwazin. Ji aliyê din ve jî guhertina demografîk ya herêmê jî berdewam dikin.

## KONTRA ÊŞKENCEYAN LI GEL DIKIN

Çeteyên kontra yên girêdayî dewleta Tirk yên bi navê Mûrad Sîno, Mistefa Ehmed Hecî Hiso, Ebû Aslan û Feysel Fûat Hemelîko li gundên Hisinê û Mîrkanê zilmê li gel dikin. Van çete û kontrayan heta niha êşkence li dehan sivîlan kirine, hin sivîl jî bi êşkenceyan kuştin û dest danîne ser mal û zeviyên wan. *R-2*

## Komîteya Hiqûqnasên Sûriyê wê sûcên li Efrînê bi belge bike





Platforma Hiqûqnasan Sûriyê bi dirûşmeya "Bi hev re ji bo parastina nasnameya Efrîna dagirkirî" li salona Beylesan a navçeya Amûdê ya herêma Cizîrê bi amadebûna 170 hiqûqnas û parêzerên Sûriyê, hat lidarxistin. Di dawiya platformê de encamname hat weşandin. Her wiha platformê ji bo Efrînê biryara avakirina Komîteya hiqûqnasên Sûriyê girt. Ev komîte wê kiryar û binpêkirinên mafên mirovan li Efrînê belge bike. *R-3*

## Şoreşa rojava ji bo cîhanê mînak e




Şoreşa rojava ya ku jin pêşengiya wê dikin bala hemû cîhanê dikişîne. Jina bi eslê xwe Îranî ya ku li Almanyayê dijî û di nava heteya jinên Alman ku serdana rojava kirin cihê xwe girt, diyar kir ku şoreşa rojava bi pêşengiya jinan jiyaneke azad afirand. Meryemê wiha got, "pêwîste tecrûbeya jin a li Rojava li Îran û tevahî cîhanê jî pêk were." *R-3*

## Gelê Babê li dijî artêşa tirk rabûye ser piyan




Artêşa Tirk ya dagirker ku herêmên bakurê Sûriyê dagirkiriye buye çavkaniya alozî û tevliheviyên li herêmê. Nerazîbûna gelên bakurê Sûriyê jî li dijî dagirkeriya Tirk her diçe zêde dibe. Gelê Babê ev 4 roj in li dijî artêşa Tirk û çeteyên wê rabûye ser piyan. Leşker û çeteyên Tirk êrîşî gel kirin û tê gotin ku herî kêm 6 kes hatine kuştin. *R-2*

## Lidarxistina Kongreya Netewî êdî ferz buye



Serokê Parlementoya Başûrê Kurdistanê Dr. Yûsuf Mihemed diyar kir ku tenê Kurd dostê Kurd e û da zanîn ku ji her demê zêdetir pêwîstiya kurdan lidarxistina Kongreya Netewî heye. Dr. Yûsuf wiha got, "bûyerên îro rû didin nîşan didin ku divê di zûtirîn dem de Yekîtiyeke Netewî ya Kurd ava bikin." *R-5*

## Gerîla Biradost li artêşa tirk teng kiriye



Artêşa Tirk a dagirker ku bi armanca dagirkirina başûr êrîş dike û hewl dide li herêma Bradostê xwe bi cih bike rastî bersiva gerîla tê. Gerîla li dijî leşkerên Tirk çalakiyên bi bandor pêk tîne. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê ragihand ku li Çelê û Lêlkanê di encama çalakiyên gêrlla de hêjmareke zêde leşkerên Tirk hatine kuştin û birîndar bûne. *R-2*

## Heta DAIŞ ji Sûriyê tune nebe em nasekinin



■ Berdevkê Fermî yê QSD'ê Kino Gabrîel li ser ji nûve destpêkirina Pêngava Bagera Cizîrê axivî û diyar kir ku pêngav bi awayekî rêk û pêk berdewam dike. Gabrîle wiha got, "Armanca me ew e ku herêm bi temamî ji DAIŞ'ê were paqijkirin. Armanca QSD'ê parastina hemû gelên Sûriyê ye." *R-4*

## HSM bi daxwaza gel hat avakirin



■ Yek ji endamên damezrîner yê Partiya Sûriyê ya Pêşerojê Mihemed El Dîn yê ji pêkhateya Çerkez diyar kir ku partiya wan li ser daxwazên gel hatiye avakirin û armanca wan jî çareserkirina aloziya Sûriyê ye. El Dîn wiha got, "Divê li Sûriyê çareseriya siyasî pêk were." *R-4*

## Surprîza vê hilbijartinê HDP ye



■ Namzetê serokkomariyê yê HDP'ê Selaheddîn Demîrtaş diyar kir ku surprîza vê hilbijartinê HDP ye. Demîrtaş wiha got, "Her du tifaqên din jî rastgirin, Namzetê çep ez bi tenê me. Ez li vir bi derfetên sifir bi baweriya ciwan û jinan kampanyayê birêve dibim. Wê hêza gel zordestiyê têk bibe." *R-5*

## Li Libnan'ê Hîzbûllah bi ser ket

■ Li Libnanê di roja 6'ê Gulanê de hilbijartin pêk hat. Li gor encamên ne fermî yên hilbijartina giştî ya Libnanê Hîzbuullah û hevalbendên wê ya bi navê Tifaqa Dilsoziya bi Berxwedanê re bi serketin. Tê gotin ku Partiya El Mustaqbel a bi lîderiya Serokwezîr Saad el Harîrî derbeke giran xwar. *R-6*

# Zilm û êşkence li Efrînê didome

**_Dawî li kiryarên leşker û çeteyên dewleta Tirk yên li Efrînê nayê. Leşker û çeteyên dagirker li Efrînê bi her awayî zilm û hovitiyê li ser gel pêk tînin. Welatiyan direvînin, malên wan talan dikin û dest datînin li ser milkên wan._**



Li Efrînê ku ji aliyê dewleta Tirk ve hatiye dagirkirin, çeteyên ku karê kontra dikin, zilmê li şêniyên Efrînê dikin ji bo bi zorê ji malên xwe derkevin. Her wiha bi êşkenceyê mirovan direvînin û dest datînin ser malên gel.

Piştî ku dewleta Tirk û çeteyên wê; El Nûsra, OSO û DAÎŞ'ê ji bo dagirkirinê êrîş birin ser Efrînê, bi sed hezaran mirovên ji Efrînê neçar man ji cih û warê xwe derkevin. Dewleta Tirk û komên wê yên çete malên gelê Efrînê talan kirin û bi sedan malên Efrîniyan û gund hilweşandin. Çeteyên Tirk niha li navend û gundên Efrînê karê kontra dikin, dest datînin ser malên gel, mirovan digirin û êşkenceyê li wan dikin.

Kontrayên bi navê Mûrad Sîno, Mistefa Ehmed Hecî Hiso, Ebû Aslan û Feysel Fûat Hemelîko ku li gundên Hisinê û Mîrkanê zilmê li gel dikin, heta niha êşkence li dehan sivîlan kirine, dest danîne ser mal û zeviyên wan.

Mûrad Sîno ev 6 sal in di nava çeteya OSO de ye. Niha jî li Efrînê ajokarê tankê ye. Bi bahaneyên cuda êşkence, zilm û zordariyê li gel dike. Mistefa Ehmed Hecî Hiso kontrayek e ku dema çeteyên OSO Efrîn dagir kirin bi wan re tevgeriya. Çeteyan li gundê Hisinê êşkencexaneyek ji Hiso re amade kiriye ji bo êşkenceyê li welatiyan bike. Hiso ku gundiyan digire û lêpirsîna wan dike, beriya niha welatiyekî astengdar ê li gund kuştibû.

Ebû Aslan ku 7 sal in di nava OSO de ye, li Ezazê dimîne. Ebû Aslan ji aliyê çeteyan ve weke berpirsyarê giştî yê gundê Mîrkanê hatiye wezîfedarkirin. Feysel Fûat Hemelîko jî tevî kurê xaltîka xwe piştî ku Efrîn ji aliyê çeteyan ve hate dagirkirin tevlî nav açetyan bû. Niha li gundê Hisinê welatiyan dike hedef. Feysel Fûat Hemelîko ku zilmê li gundiyan dike, yek ji wan kesan e ku welatiyan digire û êşkenceyê li wan dike. Çeteyên ku welatiyên Efrînê direvînin û fîdyeyê ji xizmên wan dixwazin, duh li gundê Hisinê Ehmed Hemo, hevsera wî, xwesû û apê wî dîl girtibûn û fîdye xwestin. Welatiyên hatine revandin hê nehatine berdan.

## Gelê Babê li dijî artêşa tirk rabûye ser piyan



Gelê Babê ev 3 roj in li dijî artêşa Tirk û çeteyên wê rabûye ser piyan. Leşker û çeteyên Tirk êrîşî gel kirin û tê gotin ku herî kêm 6 kes hatine kuştin.

Li bajarê Babê yê Bakurê Sûriyê ku ji aliyê çeteyên dewleta Tirk ve hatiye dagirkirin, gel rabûye ser piyan. Hate îdîakirin ku çeteyên Tirk bi çekên giran li gel reşandine û gelek ji sivîlan jiyana xwe ji dest dane û birîndar bûne. Tê gotin, komên çete yên artêşa Tirk roja 5'ê Gulanê avêtin ser Nexweşxaneya Babê û li doktoran dane. Gelê Babê jî li ber vê yekê rabû û bi qîrîna dirûşmên "Bab welatê me ye, bila leşkerên Tirk ji Sûriyê derkevin" daket qadan.

Artêş û çeteyên Tirk jî bi maşînên zirxî bi ser gel ve çûn û gule li sivîlan reşandin.

**DI ÊRÎŞA DUYEMÎN DE JÎ 6 KES HATIN KUŞTIN**

Şêniyên Babê 6'ê Gulanê jî daketin qadan û êrîş şermezar kirin. Gel ji civaka navneteweyî xwest ku pêşî li êrîşan bigirin û artêşa Tirk ji Sûriyê derxînin. Li gorî agahiyan leşker û çeteyên Tirk roja 6'ê Gulanê jî bi heman rengî êrîş birine ser gel û ji ber êrîşê 6 kes mirine, bi dehan kes jî birîndar bûne.

Tê gotin, leşkerên artêşa Tirk nahêlin ku gel ji bo tedawiyê birîndaran derxîne derveyî bajêr û raperîna li bajêr jî dewam dike.

## Kedkar û karker dîsa daketin qadan



Li Başûrê Kurdistanê ji ber ku bi salan e hikumet meaşê kedkar û karkeran nade, kedkar û karker dîsa daketin qadan û çalakî li dar xistin. Li herêmên Helepçe, Raperîn û Kelarê yên Başûrê Kurdistanê kedkar û karker, ji ber ku hikumet bi salan e meaşê wan nade, daketin qadan û nerazîbûn nîşan dan.

Karkerên ku li ber Walîtiya Helepçeyê kom bûn, ji ber ku hikumet meaşê wan nade, çalakiyeke protestoyê li dar xistin. Karkeran diyar kirin ku hikumet bi salan e meaşê wan nade û para ku tê dayîn jî ji sedî 30 ye û xwestin daxwazên wan bi cih werin.

Karker û kedkaran hikumet protesto kirin û daxwazname dan Walîtiya Helepçeyê da ku daxwazên wan were bicihanîn.

Karkerên ku li Raperînê daketin qadan xwestin ku bila hikumet meaşê wan bide û şertên wan ên jiyanê were başkirin.

Kedkar li Kelarê jî daketin qadan û polîtîkaya hikumetê ya li dijî kedkaran protesto kirin.

## Gerîla Biradost li artêşa tirk teng kiriye



Gerîlayên HPG û YJA Starê li herêma Bradostê 2 çalakiyên din kirin. Tê gotin ku di encama çalakiyan de gelek ji leşkerên Tirk mirine.

Çalakiyên gerîla yên li dijî artêşa Tirk a dagirker ku hewl dide herêma Bradostê dagir bike didomin. Li gorî agahiyên ji herêmê hatin girtin, gerîla şeva berê li dijî leşkerên Tirk du çalakî kirin.

Hêzên gerîla bi çekên giran li artêşa Tirk a dagirker xist ku li qada Kevotê ya Lêlîkanê bi cih bûbû. Wekî din li Lêlîkanê çalakiyeke din a sabotajê kirin.

Tê gotin ku di encama her du çalakiyan de gelek leşkerên Tirk mirine.

Piştî çalakiya gerîla, balafirên şer ên Tirk bombe li herêmê barandin. Balafirên keşfê jî li ser herêmê digerin.

Ji aliyê din ve Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla yên 6'ê Gulanê agahî da ku di çarçoveya "Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Agirî û Şehîd Şoreş" de hatin kirin.

HPG'ê ragihand ku di encama çalakiyên gêrîlla yên li Çelê ya Colemêrgê û Lêlkan ya başûrê Kurdistanê de hêjmareke zêde leşkerên tirk hatine kuştin û birîndar bûne.

## Hindik maye QSD bigihêje çemê Firatê



Şervanên QSD'ê, di çarçoveya Pêngava Bagera Cizîrê de ku li bejahiya Dêra Zorê ji nû ve dest pê kirine, kêm mane ku xwe bigihînin Çemê Firatê.

Şervanên Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê ku li bejahiya Dêra Zorê ya li ser sînorê Sûriye-Iraqê ji nû ve dest bi Pêngava Bagera Cizîrê kirin ber bi pêş de diçin. Şervanên QSD'ê bi kîlometreyeke din nêzî Çemê Firatê bûn û mayinên çeteyan ên li herêmê bi cih kiribûn bê bandor kirin. Tenê 4 kîlometre man ku hêzên QSD'ê xwe bigihînin gundê Bakozê yê li qiraxa Çemê Firatê.

Pêngava Bagera Cizîrê ku ji ber êrîşên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Efrînê hatibû rawestandin, roja 1'ê Gulanê ji nû ve dest pê kiribû. Di çarçoveya pêngavê de heta niha herêmeke berfireh hate kontrolkirin.

## Ger daxwazên kolberan pêk neyên em ê îstifa bikin

Parlamenterên Rojhilatî piştgirî dan çalakiya boykotê ya kolberên ku girtina sînor protesto dikin. Parlamenteran, pêşniyaznameyek pêşkêşî parlamentê kirin û gotin, "Heke daxwazên kolber û kesibkaran pêk neyên em ê îstîfa bikin."

Piştî ku rejîmê bazirganiya sînor û kolbertî qedexe kir, di serî de li bajarê Bane û Ciwanro li gelek bajarên Rojhilatê Kurdistanê çalakiyên esnafan ên boykotê pêk hatin û ev çalakî ketin roja xwe ya 22'yan. Parlamenterên Rojhilat jî piştgirî dan çalakiyan. 15 parlementerên di parlamenta Îranê de ne duh li parlamentê di derbarê mijarê de pêşniyaznameyek pêşkêşî parlamentê kirin. Pparlementeran gotin heke daxwaz pêk neyên wê îstîfa bikin.

Parlamenterê Mahabadê Mahmud Salihî di derbarê pêşniyaznameyê de daxuyaniyek da çapemeniyê û ragihand ku li Rojhilat nêzî 7 mîlyon kes bi bazirganiya sînor û kolbertiyê debara xwe dikin. Salîhî got "Astengiyên ji kolberan re tên derxistin û rawestandina bazirganiya sînor, gelê me bi tengasiyên debarê re rû bi rû hiştiye."

Salîhî ragihand ku di derbarê mijarê de serokkomar Hasan Ruhanî vexwendine parlamentê û raber kirine, heke daxwaz neyên pêkanîn wê îstîfa bikin.





# Hunermenda şoreşger, Mizgîna leheng

**_Hunermenda şoreşger Şehîd Mizgîn bi navê xwe yê rast Gurbet Aydin di salvegera 26'emîn şehadeta xwe de bi çalakiyên hunerî tê bibîranîn. Hozan Mizgîn di 11'ê Gulanê sala 1992'an de di şerekî li dijî artêşa dagirker ya Tirk de şehîd bû. Bi boneya salvegera şehadeta wê TEV-ÇAND wê çalakiyên bîranînê li dar bixe._**



Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê ya bajarê Qamişlo amadekariya bîranîna salvegera şehadeta H.Mizgîn ku di roja 11'ê Gulanê de şehîd bûbû, dike.

Hunermenda şoreşger Şehîd Mizgîn bi navê xwe yê din Gurbet Aydin di 11 Gulanê 1992'an di şerekî li dijî artêşa Tirk ya dagirker de li herêma Xerzan ya bakurê Kurdistanê şehîd bû.

Hozan Mizgîn xwedî kesayeteke dewlemend e, ji şer bigire ta bi qada siyasetê, berpirsyariya herî bilind û fermandarî kiriye û her demê di têkoşîna azadiyê de li eniya pêş cih girtiye. Di şerê dijî dijmin de, bi berxwedana fedaî heta bi guleya xwe ya dawî şer kiriye û Şehîd buye.

Îsal jî ji bo biranîna salvegera şehadeta Hunermenda şoreşger Mizgîn li Rojava bi pêşengiya TEV-ÇAND'ê rêze çalakiyên bîranînê tên lidarxistin.

Endamê Koma Sazkar ê Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê Bêkes Darî diyar kir ku ew wek navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê ji bo bîranîna şehadeta H.Mizgîn û di şexsê wê de tevahî şehîdên çand û hunerê wê bi çalakiyekên hunerî lidarbixi. Çalakiya girseyî wê roja 11'ê gulanê seat 15:00 li bajarê Rimêlanê bê li dar xistin.

4 komên straranan wê beşdarî çalakiyê bibin. (Koma Botan, Koma Sazkar, Koma Roja Welat a Girbawî û Koma Çanda Şoreşê a Taxa Xerbî). Ev kom wê stranên li ser şehîdan û stranên şehîdên TEV-ÇAND'ê pêşkêş bikin.

## Me xwest dengê berxwedanê ji cîhanê re ragihînin

Li bajarê Kobanê 5'emîn Mihrîcana Çand, Huner û Wêjeya Kurdî ya Rojava hat lidarxistin.

Mihrîcan bi armanca vejînkirina çand, huner û wêjeya Kurdî ya Rojava bi dirûşemaya, "Em hemû Efrîn in" ji aliyê Yekîtiya Rewşenbîran a Rojava ve hate organîzekirin. 24 helbestvan, hunermendên şêwekar, rewşenbîr û komên şanoyê bi berhemên xwe di mihricanê de cih girtine.

Helbestvan û nivîskarên ku beşdarî mihrîcana Rojava ya çand û hunerê bûn, diyar kirin ku wan xwest bi hunerên xwe dengê berxwedana ji cîhanê re ragihînin û bidin xuyakirin ku dewleta Tirk dixwaze dîroka gelan ji holê rake.

Helbestvan û Hevserokê Yekîtiya Rewşenbîrên Kurd a Rojava Ehmed Huseynî axivî û diyar kir ku wan xwest bi riya mihrîcana çand û hunera Kurdî dengê Efrînê bigihînin raya giştî û ji cîhanê re bidin xuyakirin ku çawa Kurd rastî kiryarên kuştin, komkujî û hemû kiryarên hovane tên.



Nîgarvan Mihemed Şahîn jî ku di tabloya xwe de trajediya gelê Efrînê xêz kir, anî ziman ku ger dagirkeriya Tirk siyasetên qirkirinê bidomîne, wê her xwîn biherike.

Şahîn desnîşan kir ku dewleta Tirk a bê dîrok dixwaze bi darê zorê dîroka gelan ji holê rake û wiha dewam kir, "Dewleta Tirk a dagirker li herêma Efrînê siyaseta qirkirinê û guhertina demografiyê dide meşandin. Lê vîna gelê Kurd ji van siyasetan xurtir e. Em ê berxwedana xwe bidomînin çand, ziman û hunera xwe ya Kurdî biparêzin û destûr nedin planên dagirkeriya Tirk. Wê Efrîn rizgar bibe."

Endama Komîteya Amadekar a mihrîcanê Anahîta Şêxî jî diyar kir ku ew kêfxweş in ku mihrîcana çand û hunera Kurdî ya li ser asta Rojava li bajarê Kobanê hat lidarxistin û wiha axivî, "Helbest, çîrok û şanoyên ku di mihrîcanê de hatin pêşkêşkirin, bal kişandin ser girîngiya domandina têkoşînê ji bo rizgarkirina Efrînê."

Mihrîcana Rojava ya çand û hunerê beriya niha li gelek bajarên Ewrûpayê hatiye lidarxistin. Îsal mihrîcana 5'emîn li bajarê Kobanê hat lidarxistin…*ANHA*

## 12. Festîvala Çand û Sporê ya Engîn Sîncer pêk hat



12. Festîvala Çand û Sporê ya Engîn Sîncer li paytexta Fransa Parîsê pêk hat.

12. Festîvala Çand û Sporê ya Engîn Sîncer li paytexta Fransa Parîsê bi beşdariya bi sedan ciwanî pêk hat.

Lîstikvanên 46 tîmên ku di tûrnûvayên futbolê yên ji bo bîranîna şehîdên meha Gulanê li bajarên Strasbourg, Rennes, Marseîlle û Parîsê têkoşiyan, beşdarî festîvalê bûn. Di festîvalê de tîmên ku di tûrnûvayan de bi ser ketin hatin pêşberî hev. Maçên nîv fînalê di navbera Qendîl Spor, Atlethîc Amed, Strasoburg Spor û Karayazi Sporê de hatin lîstin.

Di encamê de tîma Atletîc Amed bû yekemîn, Qendîl Spor bû duyemîn û Karayazi Spor jî bû sêyemîn.

Di festîvalê de komên govendê yên ji sê herêmên Parîsê hunera xwe pêşkêş kirin. Seyda Perînçek, Silbis û Tarî, Farqîn Azad û Diyar Uren jî derketin ser dikê.

Parlamenterê Partiya Sosyalîst (PS) François Puppoin ciwanên tevlî festîvalê bûn silav kir û got, ku ew kêfxweş e ji ber ku bi ciwanên Kurd re ye. Puppoin destnîşan kir ku ew piştgiriyê dide têkoşîna mafdar a gelê Kurd û işaret bi tecrîda li ser Ocalan kir.

## Jiyana gel bi wêneyan hat nîşandan

Li navçeya Seyîdsadiq pêşangehek ji bo wênegir û jinek ciwan a şêwekar hate vekirin.

Li avahiya Fakûlteya Perwerdeya Zanistê Mirovan ya girêdayî Zanîngeha Silêmanî li navçeya Seyîdsadiq a bajarê Silêmanî pêşangehek hunerî hate vekirin. Mamosta û xwendekarên zanîngehê tevlî pêşangehê bûn.

Di pêşangehê de 25 tabloyên wêne û şêwekariyê hatin nîşandan. 15 tablo yên xwendekara şêwekar Çiro Selahadîn û 10 tablo jî yên wênegir Helo Cebarî bûn.

Di tabloyan de jiyana xelkê navçeya Seyîdsadiq dihat nîşandan. Her wiha bal dihate kişandina ser azadî û heskirinê.



Pêşangeh ji 25 fotografan û 105 ji wênesazî pêktê. Her wiha 10 tablo ji çêroka Selhedîn û hevalên wî ku fotografçî Helo Cebrail çêkirin û tabloyên din ji xweza û jiyana asayî ya welatiyê li sînorê Seydisadiq bi şêwekeyî heri azad dide diyarkirin.

Aramanca sereke ya li darxistana vê pêşangehê bi hevre bikaranîna fotograf û wênesaziyê bu. Ji bo bala xwendevan bikişîne li ser xwe…

*ROJNEWS*

## Çeteyan hunermend Aslan Can revand

Kiryarên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê yên li Efrînê bê navber dewam dikin û rojane zêde dibin.

Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li Kantona Efrînê kiryarên kuştin, revandin û talankirinê didomînin.

Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li bajarê Efrînê hunermendê Kurd Aslan Can revandin.

Çavkaniyeke nêzî malbata hunermend Aslan Can diyar kir ku piştî du rojan Aslan Can vegeriyaye gundê xwe Şiyê, artêşa Tirk a dagirker wî revandin û birin cihekî nediyar.

Berî niha jî bi dehan welatiyên Efrînê hatin revandin û malên wan hatin talankirin. Ev kiryarên wan roj bi roj zêde dibin û berdewam dikin…



# Li Libnan'ê Hîzbûllah bi ser ket

***Li Libnanê di roja 6'ê Gulanê de hilbijartin pêk hat. Li gor encamên ne fermî yên hilbijartina giştî ya Libnanê Hîzbuullah û hevalbendên wê ya bi navê Tifaqa Dilsoziya bi Berxwedanê re bi serketin. Tê gotin ku Partiya El Mustaqbel a bi lîderiya Serokwezîr Saad el Harîrî derbeke giran xwar.***

Li gorî encamên ne fermî yên hilbijartina giştî ya Lubnanê, ku piştî 9 salan di 6'ê Gulanê de hate kirin, Hîzbûllah û hevalbendên wê bi ser ketin.
Li gorî nûçeya televîzyona El-Meyadîn a Lubnanê, di hilbijartina Lubnanê de Hîzbûllah û hevalbendên wê (Tifaqa Dilsoziya bi Berxwedanê re) bi xurtî bi ser ketin. Partiya El Mustaqbel a bi lîderiya Serokwezîr Saad el Harîrî derbeke giran xwar.
Li gorî daxuyaniya Wezareta Karên Hundir a Lubnanê rêjeya tevlîbûna li hilbijartinê 49,2 ji sedî ye.
Ji bo 128 kursiyên Parlamenta Lubnanê 597 namzetan li ber xwe dan. Li gorî agahiyên destpêkê 13 namzetên Hîzbûllahê cihê xwe di parlamentê de digirin.
Hate ragihandin, namzetê Hîzbûllahê Emîn Şerî 2 hezar deng ji Serokwezîr Saad El Harîrî zêdetir girt û li rojavayê Beyrûdê bû yekemîn.
Li meclîsa Lubnanê ji bo Xiristiyan û Misilmanan 64 kontenjan hene. Ji 64 kursiyên Misilmanan 28 ji bo Sûnî û Şîa, 7 ji bo Durziyan, 1 jî ji bo Elewiyan e.
Li gorî qanûnên Lubnanê Serokkomar divê Marûnî be, Serokwezîr Sûnî û Serokê Meclîsê jî Şîa be. Hilbijartina giştî ya li Lubnanê herî dawî sala 2009'an hatibû kirin. Ji ber pirsgirêkên ewlekariyê ku krîza Sûriyeyê rê li ber vekir, hilbijartina li Lubnanê di nava 9 salan de nekarîbû bihata kirin.



## Di rojeva DYA'yê de ambargoya çekan

Komîsyona Xizmeta Çekdarî ya Meclîsa Nûneran ku baskê jêrîn ê Kongreya DYA ye, wê Qanûna Erka Parastina Neteweyî ya salane (NDAA) hefteya bê nîqaş bike. Meclîsa Nûneran a DYA wê Pêşnûmeya Erka Parastina Neteweyî (DNAA) binirxîne. Li gorî pêşnûmeyê, heta ku Pentagon li ser têkiliyên DYA-Tirkiyê raporê pêşkêşî kongreyê bike, wê firotina çekên mezin ji bo Tirkiyê raweste.



NDAA erka li ser asta lêçûnên parastinê û şêweyê bikaranîna pere, mekanîzmayên kontrolê ava dike û lêçûnên leşkerî, nûjenkirin û tasfiyekirin ji her alî ve diyar dike.
Li gorî Ajansa Nûçeyan a Reutersê, heta ku Pentagon rapora li ser têkiliyên navbera DYA û Tirkiyê biqedîne û pêşkêş bike, ev pêşnûme qanûn nahêle ku çekên giran ên ji bo parastinê ji Tirkiyê re werin firotin.
li gorî NDAA bibe qanûn, gelek gav hatine avêtin. Piştî çend mehan eger Meclîsa Nûneran û Senato li ser li hev bikin, wê forma wê ya dawî pêşkêşî dengdanê were kirin. Di pêşnûmeyê de ji bo sala 2019'an budçeyek ji 717 milyar dolarî ji bo parastinê tê xwestin. Her wiha pêkanînên nû li ser pîşesaziya çekan a Rûsyayê, qedexekirina hevkariya leşkerî ya bi Rûsyayê re û veqeandina fonekî zêdetir ji şerê sîber ê bi Rûsyayê re di pêşnûmeyê de cih digirin.

## YXK'ê kongreya xwe pêk anî



Li Frankfurtê Kongreya YXK'ê ku 2 rojan dewam kir bi dawî bû. Piştî kongreyê xwendevanan daxuyanî da û wiha gotin; "Kesayetiya ku ji aliyê sîstema kapîtalîst ve hatî parçekirin bi îdeolojiya Rêber Apo re em dikarin carek din ava bikin."
Li bajarê Elmanya Frankfurtê 23. Kongreya Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê (YXK) ku 2 rojan dewam kir, bi dawî bû. Kongreya YXK'ê ku bi şiara 'Serî Hilde, xwedî li şoreşê derbikeve' dest pêkiribû, li Navenda Civaka Demokratîk a Kurd ji aliyê 40 aktivîstên YXK'ê ve belavoka ku qala pêvajoya 2 salan dinirxîne hat xwendin. Piştre rewşa rêxistinî hat nîqaşkirin.
Piştî hilbijartina rêveberiya nû, plansazî hate derxistin. Projeyên perwerde, pêvajoya hilbijartinên li Tirkiyê û ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan plansazî hatin derxistin. Piştî kongreyê daxuyanî hate dayîn û wiha hat gotin; "Xeta azadiyê xwe weke alternatifeke diyar nîşan da. Weke ciwanên Kurd û enternasyonalîst divê em xwe weke eniya vê têkoşînê bibînin. Hêzeke mezin ya me heye. Kesayetiya ku sîstema kapîtalîst parçekirî em dikarin bi îdeolojiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re dîsa ava bikin. Em ê lîstikên sîstemê têk bibin û utopyaya demokratîk ava bikin."

## Peymana nukleerê bi dawî bibe wê encamên wê xirab bin

Serokomarê Elmanyayê Frank-Walter Steinmeier derbarê peymana nukleerê ya bi Îranê re hişyarî da ku divê Peyman bi dawî nebe û got: "Bi betalkirina peymanê wê li heremê bi çek bûn dest pê bike û tiştên ku li heremê wê pêk werin wê neyên texmînkirin."
Li gor nûçeya DW a tirkî Serokomarê Elmanyayê Frank-Walter Steinmeier, di bernameya televîzyona ARD'ê de derbarê mijarên rojane de bersiv da pirsên rojnamevanan. Steinmeier, îşaret bi peymana navdewletî ya bi Îranê re kir û diyar kir ku divê peyman bi dawî nebe, û piştre encamên wê dibe ku giran bin.
Steinmeier wiha got, "Dema ku



Wezîrê Karê Derve yê DYA yê bere John Kerry ev peyman îmze kir diyar kir ku wan bi vê peymanê me şerek astengkir. Bi ya min ev gotin girîng e, bi betalkirina vê peymanê li heremê bi çek bûn wê dest pê bike û tiştên ku li heremê pêk werin wê neyên texmînkirin."
Tê payin ku serokê DYA'yê Donald Trump di 12'ê Gulanê de derbarê peymanê de biryara xwe ya dawî bide.

## Hikumet û ELN ji nû ve dest bi hevdîtinan dikin



Serokdewletê Kolombiyayê Juan Manuel Santos ragihand ku hevdîtinên bi Artêşa Rizgariya Neteweyî (ELN) re wê li paytexta Kuba Havanayê bidomin.
Serokdewletê Kolombiyayê Juan Manuel Santos got, "hevdîtinên aştiyê yên navbera hikumetê û ELN'ê wê hefteya bê li Kubayê ji nû ve dest pê bikin."
Hate eşkere kirin ku hevdîtin wê li paytexta Kuba Havanayê pêk werin.
Hevdîtinên aştiyê yên navbera hikumeta Kolombiyayê û ELN'ê yên li Ekvadorê bi fermana serokdewletê Ekvadorê Lenin Moreno hatibû rawestandin û vî welatî xwe ji garantoriya hevdîtinên aştiyê vekişandibû.

### BI FARC'Ê RE CIVÎN HATE KIRIN

Wekî din Serokdewletiyê daxuyaniyeke nivîskî li ser civîna bi FARC'ê re weşand ku Serokwezîrê berê yê Spanyayê Felpie Gonzales û Serokdewletê berê yê Ûrûgûayê Jose Mûjîca jî tevlî bûn.
Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku di civînê de li ser peymana aştiyê pêşketin heye û ev pêvajo wê bidome.


## Cûbûrî li mala xwe hate kuştin

Namzetê parlamenteriyê Farûk Zirzûr Cûbûrî yê ji lîsteya Iyad Elawî li Mûsilê hate kuştin.
Ji bo hilbijartina parlamentê ya Iraqê ku wê 12'ê Gulanê bê kirin tenê çend roj man. Namzetê Tifaqa Welatparêz a bi serkêşiya Iyad Elewî Farûk Zirzûr Cûbûrî hate kuştin. Kesên nenas ketin mala Cûbûrî ya li gundê El Lezega yê li nehiya Kayyara ya li başûrê Mûsilê û bi kêran Cûbûrî kuştin.
Li ser kuştina Cûbûrî heta niha daxuyaniyeke fermî nehatiye dayin. Cûbûrî li zanîngeheke Mûsilê jî hîndekar bû.



## Wezîrê karên hundir rastî êrîşa çekdarî hat

Li Pakîstanê rewşa ewlekariya hundirîn ne başe. Hefteya derbasbuyî di encama êrîşekê de di nav de 5 rojnamevan 25 kes hatibûn kuştin.
Vê carê Wezîrê Karê Hundir ê Pakistanê Ahsan Îkbal piştî ku beşdarî mîtîngê bû, li dijî wî êrîşeke çekdarî hate kirin.
Li gorî nûçeyên di medyaya Pakistanê de Wezîrê Karê Hundir Ahsan Îkbal piştî ku tevlî mîtînga li bajarê Kanjrûr ê Narovalê bû, li dijî wî êrîşeke çekdarî hate kirin.



Îkbal dema ku piştî mîtîngê ber bi wesayîta xwe ve diçû, gule lê hate reşandin û Îkbal ji milê xwe birîndar bû. Hate diyarkirin ku rewşa Akbal baş e û li ser jiyana wî xetere tune. Hate ragihandin ku êrîş ji aliyê kesekî 20 salî hatiye kirin.

## Brîtanyayê keştiyên şer şandin kendava Ereb

Hat ragihandin ku Brîtanyayê ji bo tetbîqateke leşkerî 3 keştiyên şer şandin Kendava Ereb.
Hat ragihandin ku, Brîtanyayê ji bo lidarxistina tetbîqata leşkerî ya bi hêzên Qeterê re 3 keştiyên şer yên bi navê 'HMS Blyth', HMS Ledbury' û 'Cardigan Bay' şandin Kendava Ereb.
Wezareta Parastinê ya Qeterê ragihand ku ev tetbîqata leşkerî ya bi artêşa Brîtanyayê re wê ji bo terorê were lidarxistin.





# Şoreşa rojava ji bo cîhanê mînak e

***Şoreşa rojava ya ku jin pêşengiya wê dikin bala hemû cîhanê dikişîne. Jina bi eslê xwe Îranî ya ku li Almanyayê dijî û di nava heteya jinên Alman ku serdana rojava kirin cihê xwe girt, diyar kir ku şoreşa rojava bi pêşengiya jinan jiyaneke azad afirand. Meryemê wiha got, "pêwîste tecrûbeya jin a li Rojava li Îran û tevahî cîhanê jî pêk were."***

Meryem Hikmet Şiwar diyar kir ku şoreşa Rojava, şoreşa jinê û jiyaneke azad afirand û wiha got, "Şoreşa Rojava li tevahî cîhanê bû mînak."
Meryem Hikmet Şiwar bi eslê xwe ji Îranê ye û ev 30 sale li Almanya yê dijî. Meryem di nava şandeya jinên Alman ya ku serdana Rojava kirin de cih girt.
Meryem derbarê armanca xwe ya hatina Rojava de wiha got, "Min li ser jinên Rojava re şoreş bihîst. Ji ber vê yekê ez hatim da ku şoreşa jin û jiyana hevbeş ku li vir tê pêkanîn ji nêz ve nas bikim."
Meryem Hikmet di berdewama axaftina xwe de şoreşa jin a Rojava wekî gaveke dîrokî bi nav kir û daxuyakirin ku jinan rêxistina xwe ava kirin, di her qadan de bi xwe xebatên xwe birêve dibin û jin xwedî biryar e.
Meryem, anî ziman ku pêwîste tecrûbeya jin a li Rojava tê jiyîn li Îran û tevahî cîhanê jî pêk were û destnîşan kir ku jinên li Îranê rastî her cure tundî û zorê tên.
Meryem Hikmet Şiwar di dawiya axaftina xwe de bang li jinan kir ku rêxistin û têkoşîna xwe ya ji bo azadiyê mezin bikin û şoreşa jinên Rojava ji xwe re mînak bigirin…*ANHA*



## Ji bo Efrînê Komîteya Hiqûqnasên Sûriyê hat ava kirin

Platforma Hiqûqnasên Sûriyê li Amûdê hat lidarxistin.Platform bi encamnameyekê bi dawî bû.
Platforma Hiqûqnasan Sûriyê bi dirûşmeya "Bi hev re ji bo parastina nasnameya Efrîna dagirkirî" li salona Beylesan a navçeya Amûdê ya herêma Cizîrê hat lidarxistin.
Platform bi amadebûna 170 hiqûqnas û parêzerên Sûriyê, nûnerên MSD'ê û Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Kantona Cizîrê û TEV-DEM hat lidarxistin.
Di dawiya platformê de, encamname hat xwendin û tê de wiha hat gotin:
"Artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li Kantona Efrînê rojane




zagonên navneteweyî û mafên mirovan binpê dikin, lê komîteya navneteweyî ya belgekirina van binpêkirinan bi erka xwe ranabe. Ji ber vê yekê wek hiqûqnasên Sûriyê, me pêwîstî bi avakirina komîteya belgekirina binpêkirinên dagirkeriya Tirk li Efrînê, dît.
Navê komîteyê "Komîteya hiqûqnasên Sûrî ji bo Efrînê ye" û navenda wê li Qamişlo ye.
Armancên komîteyê:
-Belgekirina binpêkirina mafên mirovan li Efrînê û pêşkêşkirina belgeyan ji aliyên berpirsyar re.
-Koordîneya bi hemû rêxistinên mafên mirovan.
Daxwaz:
-Divê komîteya navneteweyî were avakirin da kiryarên artêşa Tirk û çeteyên wê belge bike.
-Mekanîzmeya vegera gelê Efrînê ya malên xwe.
-Destekdayîna welatiyên ku malên wan ji ber êrîşên dagirkeriya Tirk ziyan dîtine."

## Şandeya jinên Alman serdana Şehbayê kir



Şandeya jinên Alman gihîşt Kantona Şehbayê û serdana gelê Efrînê kir.
Şandeya jinên Alman ku ji bo piştgiriya Berxwedana Serdemê û kampanya Kongreya Star a serhildana jinan ji bo Efrînê hatine Rojava, gihîşt Kantona Şehbayê.
Şande ji aliyê Endama Rêveberiya Komîteya Têkîliyên Dîplomatîk a Kantona Şehbayê Cîhan Mihemed û Endama Koordînasyona Kongreya Star Fatma Çito ve hat pêşwazîkirin.
Şandeyê serdana kampa Berxwedan a ku gelê Efrînê lê bi cih dibin, kir û rewşa gel şopand. Li kampê şande ji aliyê endamên Rêveberiya Heyva Sor a Kurd ve hat pêşwazîkirin.
Şandeyê rewşa tenduristî ya gelê Efrînê bi Heyva Sor a Kurd re nîqaş kir…*ANHA*

## Em ê mîrateyên şehîdan biparêzin


Saziya Malbatên Şehîdan a Tebqayê bo boneya 6`ê Gulanê Roja Şehîdan daxuyaniyek da û hemû şehîdên Sûriyê bibîranî, diyar kir ku wê destketiyên ku bi saya şehîdan hatine bidestxistin biparêzin.
Daxuyanî bi amadbûna bi dehan endamên Saziya Malbatên Şehîdan li ber avahiya saziyê ji aliyê Endama Saziya Malbatên Şehîdan a Tebqayê Emîna Abdulrezaq ve hate xwendin.
Di daxuyaniyê de hate gotin ku 6'ê Gulanê rojeke welatparêzî ye. Ev roj li Sûriyê û Lubnanê tê pîrozkirin. Dewleta Osmanî di navbera 21`ê Tebaxa 1915`an heta destpêka 1917`an komkujî li ser gelek rewşenbîran pêk anî.
Di berdewama daxuyaniyê de hate gotin ku faşîzma Osmanî ya dagirker didome. Di vê çarçoveyê de, siyasetên qirkirin, birçîkirin û tirkirin pêk tîne. Ev yek li Efrîna pêk anîn û tînin.
Di dawiya daxuyaniyê de hat diyar kirin ku Kurd, Ereb, Çerkes, Suryan û Tirkmen wê dawî li dagirkeran bînin, têkoşînê bidomînin û destkeftiyên bi xwîna şehîdan hatiye qezenckirin biparêzin.



## Jin hêza pêşeng ya civakê ye

Di bin dirûşmeya "Bi rêxistina hevjînên şehîdan em ê asta têkoşînê û Berxwedana Serdemê bilind bikin" de yekem konferansa malbatên şehîdan a li ser asta Bakurê Sûriyê, hat lidarxisin.
Konferans di 6'ê Gulanê li Navenda Çand û Hunerê ya bajaroka Rimêlanê bi beşdariya nûnerên Rêveberiya Xweser û Saziyên Civaka Sivîl, hat lidarxistin.
Di konferansê de Şêwirmenda Rêveberiya Xweser Arşem Çiya axivî da zanîn ku pêwîste di vê pêvajoya dîrokî de destkeftiyên Bakurê Sûriyê bêne parastin. Arşem bal kişand ser girîngiya aktîfkirina rola hevjînên şehîdan di hemû qadên jiyanê de, da bikaribin bi erkên xwe rabin.
Seroka Desteya Jinê ya Kantona Cizîrê Emîne Umer jî destnîşan kir dema ku Sûriye veguheriye qada şer, gelê Bakurê Sûriyê bi yek destî têkoşîna xwe didomînin û di pêvajoyê avakirinê de ne.
Di rêziknameya konferansê de bal hat kişandin ser van bendan, "Divê jin hêza pêşeng a xebatên aborî, civakî û siyasî be. Rastiya azadiya jinê, azadiya civakê ye. Zanebûna jinê, zanebûna civakê ye. Têkoşîna jinê li dijî zihniyeta baviksalarî, netewperest û olperestî. Pêşxistina prensîba biratiya gelan û netewa demokratîk. Misogerkirina jiyana azad."
Di dawiya konferansê de, Komeleya Hevjînên Şehîdan bi navê Komeleya Îştar hat avakirin.






## Destana Efrînê

Medeni FERHO

Efrîn destan e, ev destan wê rê li ber gelek tiştên nû veke.
Dagirkirina Efrînê, ne nişkave û ne li gorî planê çend rojan hate destpêkirin. Binyata wê, li ser bingeha faşîzma sed salî hatiye rûnandin.
Di planên sedsalî de Rusya her dem hebû, îro jî roleke kambax dilîze.
Faşîzma Tirk îdeolojiyek e û asê ye!... Ji bo gelên din, dojeha Dantê ye!... Têkiliya bi Ewropa re, faşîzma Tirk, bi rêbazên cûda meşrû kir. Bi avakirina "netewe-dewlet"an, bi qanunên hatin amade kirin û bi behaneya ewlekariyê, kiryarên faşîzan hatin meşrû kirin.
Faşîzm, tenê bi desthilatdariya otorîter, tenê bi astengkirina mafê çînê karker nayê girêdan. Berferehtir e û her dewleta ku xwedî parlamenter be, demokratîk nabe!.. Saddam, Esad û rejîmên Baasê!... Tirkiyê û bîrdoza Turkî-îslam, Teoriya Rojê û Ziman, bi doktrîna 6 tîran û 9 tîrêjên ronahiyê dojeha ji bo gelan avakirin û paydariya zanistê tê de nîne.
Dema ku hêza dewletî, mobîlîze bû û kete pratîkê, qedexekirina saziyên civakî, rêxistinî, xespkirina îradeya gelan û çînê karker dest pê kir, dibê faşîzm. Hêza mobîlîze ya dewletê, êdî ne demokrasî ye, ne huquqî ye, dibê dînazorê tunekirinê. Ji Îttîhadiyan û heta îro Tirkiye ev e!..
Li Tirkiyê, potansiyel desthilatdariya îro, ku em wek faşîzm bi nav dikin; bi Kenan Evren, wek faşîzma teoîst reng guhert. Li kolanan tirs bela kir; sazî û mafê bi têkoşînê hatibûn bidestxistin, ji holê rakirin; wek dînazor Kurd di aşê tunekirinê de hêrtin. Hilbijartinên zorê têne zanîn.
Desthilatdariyên piştî Evren teva, ji xeta Evren derneketin û wek "hevkarên menfûr" bi heman qanûnan faşîzma dewletê domandin. Yê herî "menfûr" jî Erdogan e. 8 bajarên Kurdistanê li erdê yeksan kirin, medya Kurdan, saziyên Kurdan tune kirin, şaredariyên Kurdan xesp kirin, îradeya gel ya hilbijartinên 7ê Hezîranê xesp kir... Muxalefet tune kir, akdemisyenên Tirkiyê kişûmat berteref kirin; di hilbijartinên 7 Haziranê de, îradeya gel red kir. Dema karker derdikevin kolanan, hêza kolanan, komên çete dike nava hereketê û mafê çînê karker xesp dike.
Cîhana kapîtalîst, tenê gotina "sîstema yek zilamê otorîter" bi kar tîne... Gelo ev hevok ji bo faşîzma AKP/MHP'ê bes e? Faşîzma Tirkiyê, di 3 rengan de mobîlîze bûye; Şeş tîr, 9 Tîrêj û Rabîa!... Îro Rabîa û 9 Tîrêj desthilatdar in û qirkirina gelê Kurd kirine armanca xwe.
Cîhan jan û êşa Kurdan nabîhîze û di "Destanê Efrînê" de wiha dibêjim;
"Eşkere bû, piştî komploya mezin ya cîhanî
Hate zanîn ku, GERDUNÎ YE JANA KURDAN"
.......
Şikestiya neynika dîrok Kurdan
Demsal bi gulên çilmisî rengîn in
Û valahiyên demjiyanên nenivîsî
Dagirtî ne
Di dîroka Kurdan de
Ev "waraq-i zêr"în e ku, bi pênûsên reyhanî hatine nivîsandin
Bi xwîn in,
Fermanên bi xetên dîwanî hatine nivîsandin
Bi mohra xwînê hatine mohr kirin
Demjiyana destanan derbas nebûye. Her çiqasî, gotina demjiyana computer, demjiyana teknîka pêşketî bê bikaranîn jî, gelê Kurd li hemebrî hemû teknîkan berxwedanên destanî dike. Di destanê Hindîstanê, "RANYANA", yan jî mîtolojiya Yewnana kevin de, kêştiyên ezmanî û jiyana ezmanî hene. Îro, li dijî gelê Kurd, bi taybetî di şerê Efrînê, li Başûrê Kurdistan û Herêmên Parastinê yên Medya ev teknîka pêşket û ya ezmanî tê bikaranîn.
Gelê Kurd, li dijî her cûre teknîka pêşketî, bi têkoşîna xwe destanan dinivîse. Piştî Efrînê, li Lêlikan û Bradost jî, gerilayên Kurd destanên serdemê dinivîsin. Teqeze, divê ev destan werin nivîsandin.



## Gavek jî paşde nayê avêtin

Qasim ENGÎN

Di tekoşîna li hember naheqî û taybet jî li hember dagirkerî-mêtingerî de caran paşte gav avêtinên taktîkî, dibe ku wateyê xwe hebin. Heta caran tevdaji bo ku hêza xwe komîhev bikin jîdibe ku paşde gav avêtin bibin. Heta caran dibe ku paşde vekişîn çêbin da ku bikaribin dijminên xwe bikişînin giranî, xavî û rehawetê.
Mînaka herî baş ji bo vê, taktîka Îskîtan ya li dijî Daryûsê Mezin e. Hîcreta Hz. Muhamed jî wiha ye. Her wiha taktîka Kutuzovê Uris li dijî Genaralê Mezin Napolyon jî heman taktîk e.
Bi kurtahî, dibe ku caran enî werin sistkirin û ji bo demkî werin terk kirin. Lê pir caran jî dîrokê nîşanî me daye ku terk kirina eniyan, terk kirina qada berxwedan û tekoşîn ê mirin û teslîm bûyîn bi xwe re aniye. Hêştiye ku tevahî nirx werin windakirin.
Niha li Kurdistanê dewleta dagirker ya faşîst bi tevahî hêza xwe êrîşan tîne ser nirxên Kurdan û Kurdistanê. Ev êrîş bi hinek qadan ve sînordar nîne. Berovajî, dewleta dagirker bi bîrûbawerî û hişmendiya xwe ya Îttîhatger tevahî Kurdan û Kurdistanê armanc dike. Armanc, qirkirin e. Vê qirkirinê çawa gav bi gav pêşde dibin, herkes dibîne.
Erê, dewleta tirk di heman eniyan de êrîşa dibe ser Kurd û Kurdistanê. Van êrîşan hem li hundir û hem jî li derve dimeşîne. Dîsa van êrîşan hem bi rêya ragihandinê hem jî bi rêya siyasetê dimeşîne. Çi di warî aborî û çi jî di warî ruhî de dimeşîne. Her wiha herî zêde jî van êrîşan bi rê û rêbazên leşkerî û zextan pêk tîne. Bi kurtahî, bi armanca kuştin û ji holê rakirinê tevahî derfetên xwe bi kar tîne.
Lê em bizanin ku ev dewleta hov û rejîma faşîzan di rastiya xwe de tam boran û qeyranek mezin dijî. Ev qeyran ne tenê aboriye, ne tenê siyasiye, ne tenê ruhîye, ne tenê civakiye. Na, ev qeyran û boran di serî de dîplomatîk e, çandî ye, leşkerî ye, dîrokî ye.
Herkes vekirî li Tirkiyê qala Bekaya Tirkiyê dike. Heta wek hêzên dagirker bi xwe nav kirin, qala "Ya Mirin Ya Îstîklal" dikin.
Tirkiye bi rejîma xwe ya faşîst bi rastî jî rewşa Ya Mirin Ya Îstîklal dijî. Rewşa xwe ya herî lewaz a dîroka xwe dijî. Bi gotinek din, ber hilweşandinê ye.
Ewqasî êrîş, ewqasî telaş, hemû ji ber tirsa tê jiyan kirin e. Bi êrîşên gelek mezin dixwazin him tirsa xwe veşêrin him jî hêzên berxwedêr qaşo çav tirsî bikin û ger bikaribin derbeyê jî li wan bixin.
Em bizanin ku, faşîzma îro ya AKP û MHP'ê baş dizanin, an wê êrîş bikin an jî wê têk biçin. Wek mijara bisikletê an wê pedalê lêz bizivirînin an wê bikevin.
Rastiya êrîşên ewqas hovane, faşîst û dijminane ev e.
Gelo, eger rastî ev be ma gengaz e ku, qad werin terikandin, qad werin sistkirin û çavê xwe bidin derve û enî werin berdan?
Na, di rewşên wiha dîrokî de-çi dibe bila bibe-yek erk heye, di tevahî eniyan de bê ku yek mîlîm, yek gav paşde were avêtin; berxwedan, berxwedan, berxwedan e!

# HSM bi daxwaza gel hat avakirin

***Yek ji endamên damezrîner yê Partiya Sûriyê ya Pêşerojê Mihemed El Dîn yê ji pêkhateya Çerkez diyar kir ku partiya wan li ser daxwazên gel hatiye avakirin û armanca wan jî çareserkirina aloziya Sûriyê ye. El Dîn wiha got, "Divê li Sûriyê çareseriya siyasî pêk were."***



Yek ji endamên dameziriner yê Partiya Sûriyê ya Pêşerojê Mihemed Diyai El-Dîn diyar kir ku armanca wan ji damezirandina partiyê pêkanîna daxwazên civaka Sûriyê ye û dawîkirina aloziya Sûriyê ye.
Mihemed Diyai El-Dîn ji pêkhateya Çerkese û cihê xwe di damezirandina Paritya Sûriyê ya Pêşerojê de girt. Diyai El-Dîn derbarê armanca wan ji avakirina partiya Sûriyê ya Pêşerojê ji ANHA'yê re axivî.
El Dîn da zanîn ku di encama valatiya di herêmên hatine rizgarkirin, pêwîstî hebû ku partiyek siyasî dûrî eşîran û neteweyan were avakirin û wiha got, "ji ber vê yekê, ji bo pêkanîna hêvî û daxwazên gelê Sûriyê ya pêkanîna pêşerojek aram û bi ewle Partiya Sûriyê ya Pêşerojê hate avakirin."
El Dîn diyar kir ku Partiya Sûriyê ya Pêşerojê partiya hemû pêkhateyan e û got, "Armanca sereke ew e ku dawî li aloziya heyî ya Sûriyê were. Li aliyê din jî armanc ew e ku hemû mafê jinan û ciwanan û aboriyeke baş ya welat pêk werin."
El Dîn li ser rola Mezheb û pêkhateyan ya di partiyê de jî wiha axivî, "Çi partî yan meclîsek yek alî desthildariyê digre têk diçe. Gelê Sûriyê gelekî xwedî dîroke bi pirengiya xwe û çanda xwe ya dewlemend tê naskirin. Li ser vî esasê nerîna partiya me ew e ku cihê hemû pêkhate û mezheban a rast di çareserkirina aloziya Sûriyê de hebe."
El Dîn li ser pêkanîna çareseriya aloziya li Sûriyê jî ev tişt anî ziman, "Em dibînin ku aloziya Sûriyê berevajî tiştê di çapemeniyê de tê belavkirine. Çareseriya leşkerî nayê qebûl kirin. Riyên leşkerî heta niha têk çûne, lê belê wêranî ji welat re anî û rê da ku hêzên biyanî xaka Sûriyê dagir bikin. Demografiya gelek herêman hate guhertin. Çareserkirina aloziya Sûriyê divê di aliyê siyasî de pêk were. Divê hemû alî li dor yek maseyê li hev bicivin û riyên çareseriyê bi hev re nîqaş bikin. Nabe tu beşê gelê me were paşguhkirin."
El Dîn wiha dewam kir, "Xeta partiya me ne navendî ye, tekane riya çareserkirina aloziya Sûriyê siyasî ye. Partiya me banga demokratîkbûna nenavendiye. Em tekez dikin ku ne navendî nayê wateya parçekirina xaka Sûriyê."
Mihemed Diyai El-Dîn di dawiyê de diyar kir ku ew ê rêxistinbûna partiyê li hemû deverên Sûriyê pêş bixin û buroyan vekin. Bi van gotinan dawî kir, "Ne tenê li Sûriyê lê belê li hin dewletên cîhanê jî em ê buroyên xwe vekin. Ev partî ya hemû gelê Sûriyê yên divê cihê xwe di çareserkirina aloziya Sûriyê de bigirin. Lewma buroyên me dê li her derê werin vekirin."

# Heta DAIŞ ji Sûriyê tune nebe em nasekinin

Kîno Gabriyel da zanîn ku armanca dewamkirina Pêngava Bagera Cizîrê ew e ku tevahî axa Sûriyê ji çeteyên DAIŞ'ê were paqijkirin û wiha got, "Em bi awayekî bi koordîne bi hêzên Iraqê re, şerê li dijî DAIŞ'ê didomînin. Armanca êrîşên dewleta Tirk û rêjîma Baas li dijî me ew e ku hebûna DAIŞ'ê li herêmê bi dawî nebe."
Berdevkê Fermî yê QSD'ê Kîno Gabriyel derbarê berdewamkirina Pêngava Bagera Cizîrê ya rizgarkirina gundewarên rojhilatê Dêrazorê ji çeteyên DAIŞ'ê, koordîneya di navbera QSD'ê û hêzên Iraqê de û êrîşên rêjîma Baas ên li ser noqteyên QSD'ê, ji ANHA'yê re axivî.

**DAIŞ JI NÛVE ZINDÎ BÛBÛ**

Kîno Gabriyel diyar kir ku armanca ji dewamkirina Pêngava Bagera Cizîrê ew e ku axa Sûriyê bi temamî ji çeteyên DAIŞ'ê were paqijkirin. Gabriyel wiha got, "Sedema rawestandina Pêngava Bagera Cizîrê êrîşa dewleta Tirk a dagirker a li ser herêma Efrînê bû. Vê yekê hişt DAIŞ xwe ji nûve birêxistin bike û êrîşî noqteyên me bike. Hêzên me ji milên leşkerî û lojistîk de xwe birêxistin kirin û bi planeke nû jinûve dest bi Pêngava Bagera Cizîrê kirin."

**KOORDÎNEYA DI NAVBERA QSD Û IRAQ'Ê**

Derbarê koordîneya di navbera QSD'ê û hêzên Iraqê de jî Gabriyel da zanîn ku ji destpêka şerê li dijî DAIŞ'ê de hêzên QSD'ê û Iraqê di nava koordîneyekê de ne û wiha domand, "Hêzên QSD'ê û hêzên Iraqê ji bo parastina sînorên Sûriyê û Iraqê xebateke leşkerî ya hevbeş didin meşandin."
Gabriyel destnîşan kir ku hêzên Iraqê herêma sînor ji DAIŞ'ê rizgar kirin û wiha axivî, "Ev yek bû sedem ku DAIŞ berê xwe bide herêmên Sûriyê. Wê bi koordîneya bi hêzên koalisyonê û hêzên Iraqê re êrîşên bejahî û hewayî li dijî baragehên DAIŞ'ê pêk werin. Armanca me ya hevbeş ew e ku herêm bi temamî ji DAIŞ'ê were paqijkirin."
Gabriyel derbarê ku Pêngav li ser daxwaza koalîsyonê hatiye dest pê kirin de wiha axivî, "Ev ne rast e. Di dema êrîşên li ser Efrînê de pêwîstî hat dîtin ku Pêngava Bagera Cizîrê raweste. Lê bi rawestandina operasyona leşkerî re, koordîneya di navbera hêzên me û koalisyonê de ranewestiya û hêzên koalisyonê gefên artêşa Tirk a dagirker ên li ser Minbicê û herêmên din rawestandin. QSD'ê li Bakurê Sûriyê bi desteka hêzên koalisyonê operasyonên leşkerî dide meşandin."

**ÊRÎŞÊN LI SER QSD'Ê**

Gabriyel da zanîn ku armanca ji êrîşa rêjîma Baas a li ser noqteyên QSD'ê li herêmên Dêrazorê atengkirina şerê li dijî DAIŞ'ê ye û wiha got, "Rêjîma Baas dixwaze DAIŞ'ê li herêmê mayînde bike. Dewleta Tirk jî bi heman armancê êrîşî Efrînê kir."



Berdevkê Fermî yê QSD'ê Kîno Gabriyel destnîşan kir ku armanca QSD'ê parastina gelê Sûriyê û rizgarkirina tevahî axa Sûriyê ji terorê ye. Gabriyel axaftina xwe wiha bi van gotinan dawî kir, "Em hêvî dikin ku aliyên Sûrî bi hev re bicivin û nîqaş bikin da çareseriyek ji aloziya herêmê re were peydakirin û jiyaneke azad ji bo tevahî gelê Sûriyê pêk were."

# Çete sivîl û jinan direvînin

Li Efrînê komên çete li aliyekî talan û wêran dikin, li aliyê din welatiyên sivîl ên Efrînê direvînin. Li hemberî jinên ciwan jî pereyan dixwazin.
Leşkerên Tirk yên dagirker û komên çete yên grêdayî wê piştî ku Efrîn dagirkirin, li aliyekî talan û wêran dikin li aliyê din jî niha li gundên Efrînê welatiyên sivîl bi taybetî jinan direvînin. Li gorî çavkaniyên herêmî komên çete bi hevkariya eskerên Tirk çekdarên ji Xûta û Idlibê hatin tehliyekirin li Efrînê bicih kirin. Çavkaniyan diyar kirin ku komên çekdar ên li Efrînê şêniyên herêmê koçber kirin û malbatên komên çeteyan li wir bicih kirin.

**ÇETE SIVÎL Û JINAN DIREVÎNIN**

leşkerên Tirk li Efrînê bi hevkariya komên çete, bi armanca dagirkerî û şêniyên Efrînê vala bike, dixwazin kurdan qir bikin, her rêbazên qirêj dikin. Diziya mal û milkên welatiya dikin. Talan dikin û îşkenceyê li sivîlan dikin. Zarokan direvînin û tecawizê jinên ciwan dikin. Jinan direvînin. Di demên dawî de hate zanîn ku çete bi taybet endamên Firqeya Sultan Murad a bi destê MIT a Tirk hatiye perwerdekirin û hin komên din sivîlan direvînin. Piştî revandinê, li hemberî kesên ku hatine revandin 700 hezar Lîreyê Sûriyê ji malbatên wan dixwazin.
Leşkerên Tirk û çete, ger ku malbat pereyan nedin kesên dîl girtine qetil dikin. Hate zanîn ku zarokê bi navê Mihemed Mustefa Xelîl (16) ê ji gundê Sêmalka yê girêdayî navçeya Mabata ya Efrînê girtin, kêr kirin û avêtin ser riya navbera navçeya Mabata û Efrînê. Beriya malbata Mihemed bigihêjin nexweşxaneya Ezazê, Mihemed jiyana xwe ji dest da.

**KOMÊN ÇETE DESTDIRÊJIYÊ DIKIN**

Li Efrînê komên çete yên girêdayî dewleta Tirk wekî DAIŞ'ê tevdigerin. Komên çete bi riya medya civakî dîmenan parve dikin. Li gorî agahiyan, Firqeya Hemza ya girêdayî MIT a Tirk li gundê Basûta ya navçeya Şêrewa ji gel xwest ku jin derkenevin derve û yên derketin jî bi xizmên xwe re derkevin. Jina ciwan Alîşar Ebdela ji taxa Tirindê beriya heftiyekê bi hinceta terorê hate revandin û hêj tu agahî jê tune. Jina ciwan Zozan Beşîr Silêman jî di 2'ê Nîsanê de li ser benda kontolê ya Tenedê dema vegerandina wê tevî malbatê ji Efrînê re hate girtin. Zozan bi hinceta têkliyên wê bi rêveberiya xweser re heye hate girtin. Malbata Zozan bang li rêxistinên navnetewî kir ku qedera keça xwe nasbikin.
Herî dawî komên çekdar ên girêdayî dewlet Tirk li ser malbata Henan Hesen a ji gundê Termûşa ferz kir ku keça xwe Yasemîn a 12 salî bi endamekî wan re bizewicînin…Erdogan Altan-*MA*





# Surprîza vê hilbijartinê HDP ye

***Namzetê serokkomariyê yê HDP'ê Selaheddîn Demîrtaş diyar kir ku surprîza vê hilbijartinê HDP ye. Demîrtaş wiha got, "Her du tifaqên din jî rastgirin, Namzetê çep ez bi tenê me. Ez li vir bi derfetên sifir bi baweriya ciwan û jinan kampanyayê birêve dibim. Wê hêza gel zordestiyê têk bibe."***



Namzetê Serokomariyê yê HDP'ê Selahaddîn Demîrtaş got: "Surprîza vê hilbijartinê HDP ye. Namzetê çep ez bi tenê me." Demîrtaş ji bo tûra duyemîn bang li Înce, Akşener û Karamollaoglu kir ku wî destek bikin.
Namzetê Serokomariyê yê HDP'ê Selahaddîn Demîrtaş ê girtî bi riya parêzerên xwe bersiva pirsên BBC Tirkî da. Demîrtaş têkildarî pirsa ji ber girtiye dê çawa kampanyaya hilbijartinê birêve bibe bersiva da û got: "Li vir derfetên min nîne. Derfetek pir hindik heye. Tenê bi riya parêzer û postayê dikarim peyam bişînim derve. Mixabin ev jî girêdayî rêveberiya girtîgehê ne. Lê bes li ser navê min dê HDP û bi milyonan hevalên min ên dildarên ciwan vê kampanyayê bidin ser milê xwe. Serokomarê heyî hemû derfetên dewletê û meydanan bikar tîne û kampanya xwe birêve dibe. Ez li vir bi derfetên sifir bi baweriya ciwan û jinan kampanyayê birêve dibim. Li gel vê yekê jî ez xwe bi şans hîs dikim. Lewam wê hêza gel zordestiyê têk bibe."

**DEMOKRASÎ, EDALET, WEKHEVÎ, AŞITÎ**

Demîrtaş da zanîn ku ew ê di kampanyaya hilbijartinê de mijarên mîna demokrasî, aborî, edalet, wekhevî û aştiyê derbixe pêş û wiha got: "Niha li Tirkiyê qeyrana van hemû sernavan pêk tê. Ji bo em van hemûyan pêk bînin, divê em bi şev û roj bixebitin."

**SURPRÎZA VÊ HILBIJARTINÊ HDP YE**

Demîrtaş di berdewama hevpeyvîna xwe de wiha got: "Surprîza vê hilbijartinê HDP ye. Bila her kes me ji nêz ve bişopîne. Dê hemû kes me bibîne ku ev ne îdiayek vala ye."
Demîrtaş tifaqa AKP, MHP û BBP û li aliyê din CHP, ÎP, DP û SP nirxand û her tifaqan jî wek "tifaqên rast" pênase kir û got ku tekane namzetê çep ew bi tenê ye.
Demîrtaş di der barê vê mijarê de ev tişt got: "Dê her du tifaqên rast wê me tune bihesibînin. Em ê hemû bi hev re bibînin. Ez wek namzetê çep û partiya min HDP di her şert û mercan de em ê berjewendiyên bindestan biparêz in. Ji bo serkeftin û destkeftiyên hemû bindest û gelan têkoşîna xwe dewam bikin."
Ji Demîrtaş pirsa di tura duyemîn a hilbijartina Serokkomariyê de partiya we dê çi bike hat kirin. Demîrtaş, bi awayekê pir ji xwe bawer got ku dê di tura duyemîn de bimîn e û wiha bilêv kir: "Ez hêvî dikim ku hilbijartinek baş, ji bo berjewendiya civakê û cûdakariyê ji holê rabike, bê lidarxistin. Bêguman gava namzet li qadan bin, ezê jî di hucreyê de bim. Ev bêedaletiye. Di tura duyemîn de ez hêvî dikim ku hemû namzetên din piştgiriyê bidin min. Ger birêz Înce, Birêz Akşener û Birêz Karamollaoglu di tura duyemîn de piştgiriyê bidin min, emê hemû bi hevre pergala bi edalet û rêveberiyek demokratîk li welat ava bikin."

**ÊDÎ ÎRO EM Ê MIN BIKIN SEROK**

Herî dawî pirsa 'Em ê te nekin serok' a Demîrtaş di hilbijartina Adara 2015'an de ji bo Teyyîp Erdogan gotibû, tu diparêzî an na hat kirin. Demîrtaş jî bi henekî bersiva "Êdî îro em ê min bikin serok" da..

# Planên dagirkeran wê sernekevin




Şêniyên navçeyên Hol û Şedadê nerazîbûn nîşanî binpêkirinên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê yên li Efrînê dan û gotin ku bi hevgirtin û biratiya gelan planên dagirkeran wê neghêjin serî.
Şêniyên navçeyên Hol û Şedadê têkildarî kiryarên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê yên li dijî sivîlên Efrînê, her wiha Meclîsa Dîlokê ya bi navê rêveberina Efrînê ku ji aliyê MIT a Tirkiyê hatiye avakirin axivîn û nerazîbûnên xwe anîn ziman. Şêniyan tekez kirin ku ew Efrînê bi tenê nahêlin.
Nîda Elî Salih a ji navçeya Şedadê destnîşan kir ku siyaseta guhertina demografiya herêmê tiştekî ne nû ye ji bo dewletekê ku destekê dê dide terorê mîna Tirkiyê.
Nîda di axaftina xwe de kesên ku di meclîsa Dîlokê de cih digirin xayîn bi nav kir û got ku meclîsa Dîlokê ya bi navê rêvebirina Efrînê hatiye avakirin nûnertiya gelê Sûriyê nake, ji ber ku xwe firotiye dewleta Tirkiyê.
Mihemed Abdullah El-Xilîf ê ji navçeya Holê ye jî anî ziman ku çawa herêmên Bakurê Sûriyê ji DAIŞ'ê hatine rizgarkirin, dê Efrîn jî bi berxwedaniya şervanan ji dagirkeriya Tirkiyê were rizgar kirin û got, "Em qebûl nakin ku çete li Efrînê bimînin, ew kesên ku li kêleka dagirkeran êrîşî Efrînê kirine xwe bi pereyan firotin."
Abdulsemed Ehmed Elî yê ji navçeya Holê jî diyar kir ku dewleta Tirk a dagireker û çeteyên wê xeta Osmaniyan didomînin, dixwazin demografiya herêmê biguherin û biratiya gelan têk bibin û wiha bilêv kir,"Madem şervanên mîna Avêsta Xabûr, Barîn û Polat hene Efrîn li xwediyê wê dê vegere, armancên dagirkeran neghêjin serî. Em jî dibêjin ku pêwîste hevgirtina me, biratiya gelan xurtir bibe da ku planên dagirkeran têk bibçin."… *ANHA*

# Petrola Başûr di dest Rûsan de ye

Berdevkê hikûmeta Herêma Kurdistanê ragihand ku firotina petrolê hatiye dayîn şîrketa Rûsneteft a Rûsî û ew serkêşiya hemû karê wê dike.
Berdevkê hikûmeta Herêma Kurdistanê Sefîn Dizeyî tevlî merasîmek a li Nexweşxaneya Rizgarî ya bajarê Hewlêr bû, bersiva pirsên rojnamegeran da.
Sefîn Dizeyî bal kişand ser firotina petrola Herêma Kurdistanê û got; "Xeta petrola Herêma Kurdistanê hatiye dayîn şîrketa Rûsneft a Rûsî. Ev şîrket serkêşiya hemû karên wê dike. Herêma Kurdistanê di vî alî te ti gavek ne avêtiye. Ev jî tiştek normale."



Dizeyî got; "Herêma Kurdistanê hewl daye ku 250 hezar bermîlên petrola Kerkûk bi rêya xetên petrola Kurdistanê biherikine qada cîhanê. Iraq bi xwe birêvebibe. Ev pêşniyar hatiye pêşwazîkirin, lê heya niha ti karek li ser nehatiye kirin."…*ROJNEWS*

# Kongreya Star pêngavek nû destpê kir

Bi armanca şikandina bêdengiya raya giştî û navnetewî di derbarê tecrîda li ser Rêberê Gelê kurd Abdulah Ocalan Kongra Star dest bi kampaniya sêyemîn a "Azadî ji bo Rêbertî " kir.
Girêdayî mijarê Endama Rêveberiya Kongra Star a Herêma Cizîrê Welîda Botî ev agahî dan: "Bi armanaca şikandina bêdengiya raya giştî û navnetewî, her wiha şermazrkirina tecrîda giran a ser rêbertî, em weke kongra star dest bi hemleya bi navê "Azadî ji bo Rêbertî" ku di 6 Gûlanê de hate destpêkirin kiriye. Ji bo amedekirina bernameya çalakiyê jî komîteya Perwerdê, parastine û diblomasî cihê xwe di nav komîteyê de digrin."
Welîda diyar kir ku di 7'ê Gûlanê de semîner ser rastiya Rêbertî li navendên Asayîşê hatin dayîn, her wiha di 10'ê Gulanê de ew ê ji hemû herêm û gundên Ereban wek Hol, Şedad, Til Koçer, Til Hemîs û Til Berek de rêze civîn û semîner dest pêbikin. Piştre wê li Kantona Qamişlo û Hesekê jî bên dayîn."
Rêvebira Kongra Star a Herêma Cizîrê welîda Botî bal kişan ser qonaxa sêyemîn a "Jin rabin ser piyan" û wih got: "Ji bo qonaxa sêyemîn dê di 10 Gûlanê de komîte li hev bicive û bernameya hemleya qonaxa sêyemîn wê bi rengekî cûdatir be amedekirin." *Ronahî/ Qamişlo*



# Lidarxistina Kongreya Netewî êdî ferz buye

Serokê Parlementoya Başûrê Kurdistanê Dr. Yusuf Mihemed diyar kir ku tenê Kurd dostê Kurd e, nabe çavê wan li ti hêz û dewletê be. Niha ji her demê zêdetir pêwîstiya Kurd bi lidarxistina Kongreya Netewî heye.
Serokê Parlementoya Herêma Başûrê Kurdistanê û Serokê Lîsta Goran yê Perlementoya Iraqê Dr. Yusuf Mihemed têkildar hilbijartin û nakokiyên li Herêma Başûrê Kurdistanê ji ANF'ê re axivî.
Dr. Yusuf Mihemed got: "Pêkanînên ku hatin kirin gelê Kurd ji Xaneqîn bigire heta Efrîn berdêlên giran dan. Her wiha ew bûyerên îro rû didin ji bo me dide nîşandan ku divê di zûtirîn dem de Kongreya Netewî lidar bixin û Yekîtiyeke Netewî ya Kurd ava bikin."
Dr. Mihemed têkildarî encam referandûma ku sala borî hatî kirin axivî û wiha nirxand: "Bi vê referandûma ku hate kirin bû sedem ku Kerkûk ji destê gelê Kurd biçe, dîsa kir ku gelek destkeftiyên gelê Kurd ji dest bê dayîn. Bi qasî sed salên dawî ya dîroka Kurd û Kurdistanê gelê Kurd di sala 2014-2016'an nebûye xwedî destkeftî û xaka xwe kontrol nekiriye. Lê mixabin bi pêkanîna referandûmanê bû sedem ku destkeftiyên gelê Kurd ên bi têkoşîn û berdêlên mezin hatibûn destxistin ji dest bê girtin. Tenê ne xaka Başûrê Kurdistan, ji Xaneqîn bigire heta Efrînê destkeftiyên mezin hatin destdan."

**KONGREYA NETEWÎ FERZE**

Dr. Yusuf Mihemed bal kişand ser lidarxistina Kongreya Netewî û got: "Ev hemû bûyer û rûdanên di roja me ya îro û rabirdû de qewimîn nîşandan ku ji derveyî Kurdan ti dostê Kurdan nîne . Divê di zûtirîn de Kongreya Netewî û Yekîtiyeke Netewî bê lidarxistin."

